

## *Dîmenê Mîdiyan di romana*

*JOSEF NYÁRY de*

### *Nêçîra Dawî ya Nîmrod*



**Cankurd**

February 3, 2009

### *Ev çî roman e û nivîskarê wê kî ye?*

Romana almanî “**Nêçîra dawî ya Nîmrod**” romaneke dîrokî ye, bûyerên wê di dema paş roxandina Imperatoriya Asûrî di sedsala 6ê de, berî Zayînê, pêkhatîne, ew Imperatoriya ku di Rojhilata Navîn de dikete qerezê bi Imperatoriya Fîrewnên Misirê û wan memleketên Girîkî re, ku pir hêzdar bûn, û tê gotin ku avakarê wê Nîmrodê navdar bû. Ew Imperatoriya ku gelek netewe bi darê zorê xistibûn bin nalên hespên suwarên xwe, ji wan xûk û xûn distand, bi hovîtiyeke bêwekanî zorbazî dikir, nema dikanî xwe li ber hêrişên hevbeş ên **Mîdiyan** “Pêşserên *Kurdên niho*” û **Babiliyan** ragirin, û bajêrên wan ên navgiran li ber lehiya suwarên wan herdu gelan serûbin bûn, hatine herifandin û di nav xûn û kulxan û agirê de man, deselata **Asûrî** ji sala 612 berî Zayînê ve, bi roja standina bajêrê **Nînewa** re, ciyê xwe yê bilind û diyar di nav rûpelên dîrokê de ji dest da.



Hinek serekên Mîdiyan

Di wan demên zû de, ku gelê Israîlê ji aliyê Bailiyan ve hatibû binzorkirin û bi hezaran ji Israîliyan wekî koleyan ji niştê wan hatibûn hilkirin, navên pêxemberên Israîlî yên navdar li Rojhilata Navîn belav bûbûn: **Hiziqyal**, **Jêrêmiya** û **Jêsaya**, û li welatê Girîkan, li bajêrê **Mîlet** herdu fîlosof **Thalês** û **Anaksîmander** bingeha felsefeya sirûştî ya **Iyonî** avadikirin, û li Athêna **Solon** zagon nûdikir...di wê demê de jî li Iranê **Zerdeşt** ola kevnare ya gelên wan welatan taze dikir.



Zerdeşt ê ku hinek wî pêxember dibînin

Di wê navê de, serhêzekî ji bermayên leşkerê Asûrî yê bi navê **Dagon** hebû û di koka xwe de ji gelê **Kîmêrî** bû “ji wan gelên li ber zireyê Qezwînê”, ku gelek zêr û cewher û hebûn ên giranbiha yên şahên **Asûrî** di nav hêrişkarên **Mîdî** û **Babilî** re derbas kiri bûn û revandi bûn, gihandi bûn **Qibrisê** û li veşarti bûn, û tew hîviya wî di vegera Imperatoriya **Asûrî** de nema bû.


Ew **Dagon** ê ku kesaniya lehengî ya serekîn e di romanê de, bizava xwe dike, bi piştvaniya komikeke cengawerên ku her yek ji neteweyekê bû, û berê giş bi wî re di dibistana leşkerî ya **Asûrî** de fêrbû bûn, ku kuşter û serbirrê kurê xwe **Nadîn** binase, bibîne û tola xwe jê hilîne. Di nav hêza

wî ya piçûk de **Mîron** ê **Girîkî** yê ku bi xinizî heye, lê tevî wê xiniziyê jî, ew jîna **Dagon** sê caran ji kuştinê diparize...

Li gor romanê, ku lehengê wê ji **Qibrisê** diçe **Mîlet** a li başûrê rojavayê **Türkiye** ya niho, ji wir jî diçe **Misirê** ba **Fîrewn Hofra**, û ji **Misirê** derbas dibe **Filistînê**, pişt re diçe welatê **Şamê**, û li teviya **Mêzopotamiya** û **Iran** û welatê **Mîdiya**, li herdu aliyên **Zagrosê**, li kuşterê kurê xwe digere. Ew kuşter **Havaksatara** bi xwe ye, padişahê **Mîdiyan** e.

Paş ku **Dagon** gelek kesan dikuje, bi harîkariya **Nêrgal Serêzer**, ku serhêzekî **Khaldî** bû, û bi piştvaniya mîrê Farisan **Qembîz** “*Bavê Kureş ê navdar*” xwe digihîne **Havaksatara** yê ku hîç qehremanekî nedikanî zora wî bibe, wî û serhêzê wî, li gel komeke ji peyayên wî jî dikuje, lê dawî **Dagon** li xwe hişyar dibe, ku hîç têkiliya **Havaksatara** bi kuştin û serbirrîna kurê wî **Nadîn** tune bû. Ji wî re agahî tên, ku jîna **Havaksatara** yê **Mîdî**, **Kesnedane** ya hovbaz kurê wî kuştiye. Paş ku mêrê wê hate kuştin, ew û kurê wê **Îstewêgo** “*Hestiyax*” li ser deselatîyê li paytextê **Mîdiyan**, **Ekbatane** “*Hemedan a niho*” li hev nakin, ew direve, diçe li **Babilê** mafê penahiyê distîne û li wir jî wekî jîneka navdar û bi hêz ciyê xwe digire.

**Dagon** rêya xwe diguhêre, ew naçe **Ekbatana**, ew diçe **Babilê** û li wir dîsa bi harîkariya **Qembîz** ê lawaz dikare **Kesnedane** bikuje, lê pişt re li xwe hişyar dibe, ku **Kesnedane** hem dayîka wî bû û hem jî jîna wî bû... !!!



Kureşê ku dayîk Kurd bû û bav Faris bû

Li dawiyê, derdikeve ku ev hemî pilana serhêzê **Khaldî**, **Nergal Serêzer** bû, ku lehengiya **Dagon** û hevalêd wî ji xwe re bi kar bîne, da bi wan malbata deselatdar a **Mîdî** bi tevayî qir bike, ku **Mîdî** nikanibin welatê wî di bin zora xwe de bicivilînin. Kuşterê kurê **Dagon**, **Mîron ê Girîkî** bû û hîngê **Nergal Serêzer** wê kuştinê bi çavên xwe dibîne, seriyê **Nalîn**

dibirre û dişîne ji bavê wî **Dagon** re, da bi wê şêweyê pilana xwe bibe serî...

### ***Nivîskarê romanê:***

**Joséf Niyârî** nivîskarê vê romanê ye “ji 600 rûpelan e”, ku ji aliyê weşanxaneyê **Fischer** a navdar ve, di bin jimareya [ISBN N 3-596-28073-7] de, sala 1984ê li **München** derketiye. Ew sala 1944ê li **Berlinê** ji dayîk bûye, lê wekî ji paşnavê wî dixuye, ew ne **Alman** e, û ne dûre ku kesekî **Asûrî** be... Ew li **Hamburg** wekî rojnamevan û nivîskar jiyaye, li ser cenga **Yom-Kuippur** û birçîbûna mezin a li qeraxên rojhilatê **Afrîka** û li ser projeyên mezin ên li ser çemê **Nîl** raporin fireh nivîsandine. Ew bi romana xwe ya pêşîn “**Ez, Aras...** (1982)” hate nasîn, û paş va romana xwe “**Nêçîra dawî ya Nîmrod**” hinek xebatên wî yên di jî hene... Ew pir baş haydar e li ser **Rojhilata Navîn, Misira Fîrewnî, Israîl** a kevin û teviya dîroka Girîkî, felsefeya Girîkî û li ser ol û dîroka gelên di navbera **Xurasan** û **Misir** û **Yûnanê** de, lew re jî romana xwe bi gelek agahiyan dagirtiye, ku roman bi wan pir hatiye girankirin, mirov carina jê hosan dibe.

### ***Dîmenê Mîdiyan di romanê de:***

Ji ber wê dîmenê gelek nebaş ê ku di romanê de bo **Mîdiyan** hatiye pêdakirin, ez guman dikim, ku ev kes bi xwe **Asûrî** ye. Ew ji aliyekî ve hemî şêweyên şaristaniyê, zanînê, îzanê ‘maarifetê’, ronakbîriyê, mirovatiyê û hişmendiyê, li gel pêzanîna leşkerî û pêdakirina pêkarên cengê, pilankirin û endizyarî û xweşnivîsandin û huner û jîna paqij bo **Asûriyan** dijimêre, ta wan serohat û zanînen baş ên ku wî li **Yûnan, Qîbris, Misir, Flistîn, Şam** û teviya **Iran** û **Mêsopotamiya** dîtine, ewana giş di binyada xwe de ji **Asûr** hatîne... !!!

Tersî van qenciyan, ew hemî pîsîtiyê, nezanînê, hovîtiyê, xiniziyê, bênamûsiyê, qerêjiyê û her babeteke talankerî, dizkarî, û nehişyariya şaristanî bi ser **Mîdiyan** ve dijimêre. Weku dîmenê **Cihowan** li ba **Ereban**, an yê **Kurdan** li ba **Turkan**, an jî yê **Cihowan** li ba **Naziyan**, ew bi wî rengî **Mîdiyan** di romana xwe de dide xuyakirinê. **Havaksatara** hovbazekî ku ajal û cinawerên çolê pir ji wî naziktir û zanatir û hêjatir in, lê jina wî hîn ji wî hovtir û ji wî ajaltir e...

Tenha di derekê de ji romanê dibêje, ku gava Mîdî diketin cengê, suwar û peyayên bi padişahên wan re herdu basikên padişahê xwe diparistin, hema pêşiya wî her vekirî bû, ew her di seriyê leşkerê xwe de bû, û bo wan gelek şermzarî bû, ku di pêş padişahê xwe de derkevîne qad û trata cengê, ew hîç carekê di koçka xwe de nedîma gava leşkerê wî diçû cengê... Wekî dixuye, nivîskarê romanê vê qencyê û mêraniyê jî wekî nîşaneke neşaristaniya **Mîdiyan** dibîne... An jî padişahên Asûrî ne wekî yên **Mîdiyan** wêrek bûn...

Hemî gelên Mêzopotamiya neyarên **Mîdiyan** in, tew ji wan heznakin, nevîna wan dikin û giş harîkariya lehengê romanê dikin, da deselata **Mîdî** li **Ekbatana** biroxînin. Ta **Fîrewn** ên **Misirê** û talankerên çolistana **Ereban** di vê romanê de ji **Mîdiyan** şaristanîtir in û nevîna hovbzaiya wan dikin...

Gelo, ma ev ne ew dîmen bi xwe ye, ewê ku di film û çêrok û roman û dîroka **Turkan** de li ser gelê **Kurd** têye nivîsandin û belavkirin?

Em dibînin, ku neyarên me ne tenha bi siyaseta xwe dij bi neteweya **Kurd** dixebitin û bizavên “**Hovbazkirina neyar**” dikin, ku bingeheke navdar a cengaweriyê ye ... û em tev jî dizanin, ku ev dîmenê pir nebaş, kirêt û qerêj, bûye egera revîna pir zarokên kurd ji kesaniya xwe ya neteweyî, ji ber ku di dibistanên turkî de ewana wilo têne fêrkirin, ku ji neteweya xwe nevîn û nefretê bikin.

Li hember vê qerêjkirina dûroka neteweya **Kurd**, pêwîste nivîskarên me jî devzendên xwe vemalin, divît û qelemên xwe bi kar bînin, da hêrişên zorbaz ên neyaran ji ser neteweya xwe bişikînin... Bi roman, bi şano û bi her terzekî weşanên mediya ya nûjen, bila bizavên hêja bînin kirin, da ev netewe jî rûyê xwe yê paqij di nînika çandeyî de û di dûrokê de bibîne.